# KEMAL NECIM
# KEZÎZER

## Helbest

Kezîzer

Kemal Necim

Derhêner û çapa dîjîtal
Sîrwan Hecî Berko

Ji weşanên Malpera Amûdê
Hejmar: 29

www.amude.com
info@amude.com

Hemû mafên çapê parastî ne.
© Kemal Necim û Malpera Amûdê ( 06/2003 )

# NAVEROK

Kezîzer/ 5
Kezîzer / Zayîn/ 7
Kezîzer /Koçerî/ 9
Kezîzer /Mîna oxirê/ 11
Kezîzer /Bêrîkirin/ 12
Kezîzer /Jibîrkirin/ 14
Dadgeh/ 16
Zîlan/ 20
Xewn/ 23
Baran/ 28
Vê biharê/ 29
Ji stêrkê re/ 31
Dîsa ji stêrkê re/ 33
Keke/ 34
( .. .. .. )/37
Kobanê/ 39
Demê/ 41
(…………)/ 43
Dizî/ 44
Kurte çîrokên heftiyekê/ 45
Heft çîrokên şevekê/ 49
Heft şevên çîrokekê/ 54
Şano/ 58
Jînenîgariya dilbijokekî/ 60
Ew helbest/ 67
Riwê te/ 69
Sersalname/ 71
Derya/ 74
Cejin/ 76
Tenahî/ 79
Tu jî mîna minî/ 81
Bîranîn/ 87
Pirs/ 89
Ezê bêm/ 90
Ji hemwelatiya baranê
û serhildanên hilweşiyayî re/ 93
Helbestên te/ 96
Newrozname/ 101
Ji bêhişekî ji biharê hezkir re/ 104

Keçên agir
Keziyên xwe di xewnê de
Veşartin
li paş bihara çiyê
li perestgeha Zeredeşt
digeriyan
hooo…. Zeredeşt
vaye em hatin:
perestgeh dizanin xwe
veşêrin
lê…. agir ?!!



## Kezîzer

Vê çîrokê jî wisa destpêkir..

Roja ku bihîstin
ez
helbestan
vedixum
Av
Ji Ser
Çavên
te
Birîn ……

Ev çîrok hêjî bi dawî nebûye.....

## Kezîzer
## Zayîn

Deh salan berî kezîzer
Mirin za! û Keçek çêbû
Nav lêkirin "AŞTAR" ,...
Keça mirinê.
Deh salan piştî mirinê
Aştar za! û keçek çêbû
Nav lêkirin " KEZÎZER " , ...
Keça Aştar .
Aştar, ji çavên keça xwe re
li rengekî digeriya,
biharê pêrgî du evîndaran
hat,
Asman û Deriya,
Wan ji mêj
Berî zayîna mirinê
Ji hevûdin hezkiribûn
Hevûdin hembêz kirin, û
Ji tirsa mirinê, ketin



Xeweke giran....
Aştar, biharekê bi ser
evîna wan de
giriya
Biharekê ew ji mirinê
Veşartin
Bihara sisiyan
Ji çavên keça xwe re
ramûsanek ji asmanan
yek ji deryayê
dizîn!
ji wê rojê de
çavên asmanan
çavên deryayê, û
çavên Kezîzer
şîn bûn.......

**Kezîzer**
**Koçerî**

Tembûrekê ji Eyşeşan re
Yekê ji Mihemed Şêxo re, lêxe
Felekê
Kezîzer îro
Bayê evîna xwe
Li sitûna konê te
pêçaye
mêvana te ye
şanzde salin rêwiye
hêjî bawer dikê
ewê rojekê bi heyvê re hêlik
bileyize…
Eger te ew dît
felekê,
qermîçokên eniya xwe
veşêre
wê netirsîne
Çîroka xwe û Mihemed Şêxo



Jêre nebêje,
min carekê jêre gotibû ;
felek
ne bê bexte… !
pirpirîkên wê nefirîne,
dibe ku pir bêriya
zarokên taxê
kiribe .
bila bayê te bi keziyên wê
neleyîze ,
hîna piçûke.
Eger ji te pirsî;
Li paş vî çiyayî dûmanek heye…?
Tiyê jêre nebêje,
Li wî çiyayî hêjî mîna te
Kezîzer
Li hêviya berbangê
keziya
azadiya
xwe
dihûnin…!

## Kezîzer
## Mîna Oxirê

Here ...
Kenê min yê dawî
giriyê min yê dawî
bi xwere bibe û here.
Here û li şûna xwe
mîna hemûyên din
wêneyeke awirên kûvî
li nav rûpelên
tenahiya min de veşêre.
here û dilê xwe
li vê derê bihêle
dilê min tenê
têra
pêjna vegera te nake
ez dizanim, dilê te jî
mîna keziyên şoreşa min
îro dişewite.
here û ...



## Kezîzer
## Bêrîkirin

Her ku bêriya te dikim
li xwe digerim ..
Her ku xwe dibînim
wê rojê
hemûyê min tiwî.
ka rabe kezîzera min
emê
ji pêsîra vê êvarê
xewneke xwe bidizin!
rabe û,.. hay ji keziyên xwe
hebe,
li vî welatî keziyên xewnan
dişewitin.
li vî welatî
li benda zayîna miriyekî
gornepaş
peymana xewnên qedexe
dixwînin.

rabe ji dilê min re
li laşekî bigerin,
laşê min îro dîsa
şewitî
rabe em di pêsîra vê şevê de
xewnên xwe yên
tazî
binixumînin,
li vî gundî
şev
şerme.....!!



**Kezîzer**
**Ji bîrkirin**

Pêjna kenê te
mîna pûtekî kevirî
di nava bîstikên bêrîkirinê de
çikandim,
li ber deriyê mizgeftan
hezar carî, şikandim
li ber serê mirinê
kevir bi kevir
li goristanan gerandim.
pêjna kenê te
piyalek mey
ji nav teliyên olperestekî kalemêr
bi ser desmala dîlbera ciwan de
rijandim
mîna helbestekê, ji nişkave
ji hiş revandim
û wekî baraneke bê demsal
bi ser taya hevokan de barandim...

Ez di tirsim îro jî bişkêm û
birijim...!
Kezîzer;
te çawa
leglegên gundê me
hînî bêrîkirina biharê
kirine,
xecxecokên şermok
hînî diziya ramûsanan
kirine,
te çawa,
asman û deriya
hînî rengê çavên xwe
kirine,
min jî hînî jibîrkirinê
bike
bila îro
pêjna kenê te
mîna pûtekî kevirî
careke din
min
neşikîne......



## Dadgeh

Heme îro,
Ji gemiyê riwek rijiya
Û dadgeh
Bi riwekî
li ser Cûdî
rawestiya....!

# Dadgeh

Buhayê min
Çermekî rizî yê
hovîtiya mine...!
Lo mirovo,
dibêjin rojekê
li bazara Romayê
mirovekî mirovek xwar.....!
Ji wê rojê de
dadgeh bû pêlava
mirovê ku mirovek
xwar.....!!



# Dadgeh

Tenê ez gunehbarê
li ber dadgeha te bûm
Tenê ez
di cama awirên çavên te de
dîl mabûm
wê rojê
Tenê ez û
taya minî sar
li ber sıya evîna te
şewitîn
Wê rojê...
Tenê di guhê min de
çinge çinga
mêxên rizî
du hezar sal
dikutan
Wê rojê ..,
di çavên te de
wêneya Manî

Li rengê xwe di geriya,
Tenê di çavên te de
rûpelên Zend Evista
dişewitîn
Wê rojê
" here bi pirse"
Zaredeşt digot
"yê ku wê bê tiwî
lê em li benda yekî din bin"
tenê ez û
perestgehên ji camê
pêxemberên ji camê
xwedayên ji camê û
dadgehên ji camê
hûrik hûrik
dişikestin
li ber nimêja te
wê rojê……



## Zîlan

Keziya xwe bi sê
biskan
hûnabû,
Mirin
Jiyan
Evîn !
Jiyan; dergûşa di bin barê
xewnên zaroktiyê de
dişewitî…
zaroktiya ji zaroktiyê direvî,
direvî dibezî û direvî
û dergûş dişewitî
sal ji salê direvî
ta bi çardeh saliyê
direvî,
di çardehê de bû heyv
di heyvê de bû
evîn.
Evîn; tîrek ji agirê laleşê

di dilek
qeşa de
qeşayek sar, diwerivî diwerivî
dibû av
di herikî
lê... şil nedibû
sar nedibû
axa ziwa, axa şewitî.
Evîn, du çivîk bûn
qirşikên sivik
– di nav bayê bablîsokê de
avjenî dikirin –
dihejmartin,
bablîsoka dîn newestiya
ranewestiya...
Evîn awazek bê tel bû
dil awaz dilorandin
awazan telî dixwarin.
Teliyan têl dixwarin
lê têl.....
ker bûbû, stûr dibû
gij dibû gincir dibû



dibû sitirî dibu sînor û
dil diqelaşt
yek bûn dido
dido bûn çar... û
dil bûn çar.
Evîn, çîroka ji mirinê re
hatibû ristin
Mirin; agirê ku dilê
Mem û Zînê
Birajtibû.
Keziya xwe bi sê biskan
hûnabû
mirina bi çardeh dergûşan şewitî
bû Zîlan
Zîlana bi çardeh agiran şewitî
bû evîn
evîn bû
agir....

## Xewn

Dûmanekî westiyayî
ji nav agirê cixarê,
bê pêjin bilind dibû,
bilind dibû,
dibû asman.
Awirên winda
li pey şopa dûmanê
pêrgî stêrekê, dibe jî
bîranînekê,
hatibûn.
nizanim dûmanê cixarê
nizanim kela evîneke
kevn,
hêstireke fedyok
ji çavên wî di xindirandin.
… ew carekê van çaxan
bablekan
dilîstin…
.............



ew carekê van çaxan
bi çiyan re
pêşbirka bejin bilindiyê
û carna jî
ya azadiyê... dilîstin
lê ne çiya xwe gihand
bejna wî,
ne jî wî
bejna azadiyê hembêz kir.

***

li lingê xwe geriya...!
hate bîra wî,
lingekî xwe li wê derê
dûr dûr
hiştibû,
ew xelata evîna wî,
xwenên zaroktiya wî bû.
........
di nav stêrkan li bîranîneke xwe
digeriya,
ji bîstikek xew re

li hebmêza dayika xwe
digeriya
û ji hêstirên xwe re
li riwê xwe
riwê yara xwe
digeriya…
………
negere heval.... negere
ha li wî çiyayê ser bi dûman
li wê derê ku tu carekê van çaxan
bablekan
dilîst,
niha jî hevalên te,
li wê derê, duh nizanim îro
sê dilop xwîn û
stêrek rijiybû,
li wê derê
ew xelata ku te dabû,
diyariya ciwaniya te,
veşartiye
li benda vegera te ye…
…………



ev çiya wê rojekê
çavên xwe
li çavên te yên rojhilatî
û riwê te yê genimî
bigerîne.
Ev çiya wê rojekê
bêriya dengê te yê çiyayî
Û sitrana “ Ez xelefim”
bike....
.... negere heval.... negere

***

xewek zirav
bîranînên wî dizîn,
li paş siya xewnê çiyayek heye
hêêêê … hevalnooo…
li benda min bin
vaye ez têm,
li dûr, li paş siya heyvê
çiyayek heye
vaye ez hatim
li benda min bin

dibezî dibezî
carna jî difiriya difiriya
ta ku asman diwestiya.
..........
li wî çiyayî
bi sedan bi hezaran dest
direêj dibûn
li benda vegera wî bûn
vaye ez têm,
sê gav, du gav,
gavek maye, ez hatim,
destê min bigrin,
destê xwe dirêj kir,
… heval
heval
roj baş…



## Baran

Xweziya bi tenê
li dûr û dûr
Bin siya xewnekê û
baraneke pir hûr
Yek bi yek şil bibin
rûpelên bîranînên
bê nav
Yên zarokekî ciwan û
ciwanekî kal
Dilop bi dilop
hêstirên çavên min
Û peşikên xunava wê baranê
bibin hevparê gunehbariya
windakirina
bîranînên min,
Û bila ez
Bigirîm û
Bigirîm …

# Vê biharê

Vê biharê
Helbesta min
di nav bijankên te de
    dîl mabû
eger tu bigirî
wê navê wê helbestê
" bijankên te" be
eger tu bigirî
wê navê min jî
mîna yê gundê me
bibin dido…
………
vê biharê
hemû reng
di çavên te de
    bûne asman
eger tu bikenê
wê derya jî
li herdû qeyîkên winda



    bigerê
eger tu ne kenê
    û nejî bigirî
wê dîsa bêjin:
bêhişekî
ji biharê hez kir
bihar jî
ne kenî û
    ne jî
    girî ….

## Ji stêrkê re

Ew stêrka li şeva xwe
digeriya
Gelo, Kî dizanê
şev bi kûde çû ..?
Ezê îro dîsa
bi ser xewa kê de
birijim..!
Li min bibûrin,
Piçûkno , mezin'no
Dizno, evîndarno
Hunermendno, reşikno
sipîno
Çiyano, asmanno
Stêrkno, çav şîn'no
Ez ji we hemûyan
hezdikim
Cara dawî şeva we
hembêz dikim
Ezê îro



Bi ser xewa xwe de
birijim...!
Li min bibûrin
.. bi xatirê we...

# Dîsa ji stêrkê re

Ew stêrka
        bi xewnên min dileyîze
Êdî hew…
Ez niha hînbûm
      ez êdî nikarim
      bi asmanê te yê şemîtok ve
                           hilkişim...
êdî hew
          xewa min biwestîne
li min bibûrîne
ez cara dawî şeva te
                hembêz dikim
         … bi xatirê te…



# Keke

Keke
Tiwî hatî lê dengê te bû ..?
Yan ew sîbû,
Siya giriyê te yê
rewrewk
Ji şerma mêraniyê
                    vedişart
                       lê min dît,
ne di çavên te de,
     di soza dawî de
     di hembêz kirina dawî de
min dît çawa
siya te digiriya .
Keke
Ew tiwî hatî lê siya min bû..?
Tê bîra te,
siya min di paş
wêneya heyvê de winda bû
                               wê şevê

tê bîra te
te digot
Ezê siya te ji rojê
bihûnim û
bi tava biharê ya yekemîn re
bihinêrim.
Keke
Tiwî hatî lê
nameya min bû li min
vegeriya
Hemû rojên min
berî nameya te
diçin ava
Ez ditirsim
mîrê mirinê
berî nameya te
min bixwîne.
Keke , hêjî hêstirên te
li ser guliyên min
bi rojê re mîna xunavan
dikenin
Ezê wan li hev bicivînim



bi xwe re bibim sersalê
Keke
tiwî hatî lê sersalbû..???

## ( .. .. .. )

Mîna mûmekê
domikên dawî
rûpel bi rûpel
di şûşeya salnameyê
serxweş
dişewitîn
Ev salên serxweş
mîna feleka min
Ev salên şil
razan
mîna çavên dayika min
Ev sal,
bi lez bi lez hatin
mîna bihara welatê min
berî barîna evîna yekemîn
şûşeya sersala zayîna xwe
vexwarin û
çûn



Wisa jî
hemû mêvanên te
xewn bi xewn
mîna
"mûma li ber bayê"
hatin
piyalek şev jî
venexwarin û
berî barîna azadiya
yekemîn
xewna sersala şewata te
şikandin û
çûn…

# Kobanê

Konek min heba
di deriya çavên tede
vegirta
Minê hemû germa havîna te
di deriya evîna xwe de
bişûşta
Minê ji vê şeva te ya
fedyok re
çiroka rojên te yên dirêj
û westiyayî
bixwenda
Min vê havînê li şûna
kaniyên te yên miçiqî
firek av
bidîta
Minê pirsa wan bikira
ku çûn û nehatin
û bêhna şewatê
Çîroka axa di paniya



lingê şivanê sêzdehsalî de
qelişî bû
li wî gundê jorîn
Ka ji min re bêje şivano
zarokên vî gundî çima
nagirîn ..?
dibe ku li hêviya biharê
dikenin.
Yarek min heba
bila navê wê
kobanê
bana
Minê ji herdû lêvên wê
ji deriya çavên wê
firek av vexwara
yek jî bida
piçûkan
Bila paşê bigota:
yara te jî
xwe
şewitand

## Demê

Îro jî
Ramanên min
di valehiya vê demê de
belav û belav bûn
Ne min, nejî demên vala
nikarîbû wan ramanan
berhev bikin
Demê...
Gazina min ji te ye
Te ez xapandim
ji xewnên zaroktiyê
dizîm
Li bin konê ciwaniyê
mîna rêwiyekî
têra bîstikek girî jî
rûneniştim
Salên min
mîna çemekî tî
ber bi deryayê ve



rijandin
Ka hêbe demê
ez êdî nemam û nemam
Şevên min têra valehiya te
nakin
Xwezî şevekê , heme şevekê
Cirîda hespê te
li bin siya temenê mayî de
rawestiya
Minê ji helbesta xwe ya dawî re
darbestek birista
Paşê min û te
demê
xatir ji hev bixwesta
Û ber bi asoya oxirê de
wekî toza cirîda
hespê te
belav û belav bûma

# (...........)

Çi bikim
Ji bîr nakim
ew roja sersalê
li wê malê
Li benda min bû
nizanim li benda kê
Min fedî kir û
te jî
Kesî nebihîst
Kî hatibû ji boyî kê û
li benda kê
Îro dîsa sersale
Ez li virim
lê tu... ?



# Dizî

Ezê xwe hînî diziyê bikim
û rojekê
Kenê te bidizim
Li kolanên bajarê Qamişlokê
bifiroşim
Evîndar û
zarokan
giriyê wan ji xwe re
bikirim
Ez tenê dizanim
girî jî
bi qasî
kenê te
xweşike...

# Kurteçîrokên heftiyekê

**În**:

Bêhişekî ji biharê hezkir.

**Şemî**:

Dayikên şemiyê
li dayikên duh rast hatin
bi hevre
Li dayikên xwe
digeriyan...!

**Yekşem:**

Helbestvan
li hevdû civiyan
Helbestek bi agirê çixarê re
şewitandin ..!
Yek di binê fincanê de



winda kirin,
Yek tazî bû
Di nav rûpela rojnameyeke biyanî de
nixumandin,
Yek qedexe bû
Simbêlê wê kur kirin
nav lêkirin
"Ax kurdistan "
ya dawî jî
ji xwendinê re
veşartin.

**Duşem :**

Moskova digot:
didoyên biyanî Qada Sor
şewitandin...!

**Sêşem:**

Ji çiyê nameyek hat
digot:

Yê ku dinalî ne birîndarek bû,
ew
guleya dawî bû...

**Çarşem:**

Siyamend ji mêj li hêviya
nêriyê pezkûviyê
mabû:
"Ev çîroka ji xewê girantir
wê kengî razê"
Tîr û kevana xwe hilgirt
li pey şopa pezkûviya
çiroka xwe
digeriya.

**Pêncşem:**

Ne pêncşemê
lê wê rojek bê
Ezê çîroka yekî ji we re bêjim
Sê hezar salin ji giriyê xwe re



li malekê
digere..

**În:**

Dîsa bêhişekî
Ji biharê
Hezkir..!

# Heft çîrokên şevekê

## Çîroka yekemîn

Baran dibariya.
.............
Gundiyekî ji gundiyan dipirsî !!
- Ewê ku duh êvarê
ta bi asmanê harbûnê
bi ser xewnên me de di....??
- Yê ku baran dibarî ewr bû !!
- Lê yê ku digirî ?
- Ew bû ew......!

## Çîroka duyemîn

Baran dibariya.
..........
Rabe em di pêsîra vê şevê de
xewnên xwe yên
tazî



binixumînin.
li vî gundî
şev
şerme...

## Çîroka sêyemîn

baran dibariya
..........
şevên baranê
ji şopa karwanê bazirganan dirêjtirin.
Hemû rêyên hevirimêş
di zozanên te de
rastî vê şevê hatin.
Îşev jî
min bikire
min bifroşe xwe... û
bejna min
bost bi bost
li xwe
bipîve...!
Îşev jî

**Çîroka çaremîn**

Baran dibariya
.......
Riwê dayika pîr û
wêneya hespê şînboz
ji poşmaniyê
bûn nivînek xwîn
bi ser şeva Memê de
rijiyan...
"Hoy hoy Memo
hespê Memo şînboze
jaro dilo Memo
hespê Memo şînboze"

**Çîroka pêncemîn**

Baran dibariya
..........
ev zagonên we
giloverin
giloveeaaaar



.....
ji wê rojê de
Galîlo bidarve dikin!!

**Çîroka şeşemîn**

Baran dibariya
...........
ji zindanan nameyek hat
dibêje:
ji min re pelek şev rêkin
ezê ji we re riwekî azadiyê
nîgar bikim..!!

**Çîroka heftemîn**

Baran dibariya
.........
-bi xatirê te..
..........
ji şerma mêraniyê

hêstirên xwe di kenê wê de
dikuştin....
- di be ku careke din
şev pêrgî me neyê,
lê her ku baran bibare
ji bîr neke.....
.....bikene....
bixatirê te!!
........
baran dibariya
............
Gundiyekî ji gundiyan di pirsî !!
- Ewê ku duh êvarê
ta bi asmanê harbûnê
bi ser xewnên me de di....??
- Yê ku baran dibarî ewr bû !!
- Lê yê ku di girî ?
- Ew bû ew......!



# Heft şevên çîrokekê

**şeva yekemîn**

mêrkujekî nenas
ji tirsa çavên xwe
li şevê digeriya.
Kuştiyekî nenas
ji tirsa şevê
li çavên xwe digeriya
***
**şeva duyemîn**

tenê Agir
dizanin
tariyê Kedî bikin
***
**şeva sêyemîn**

yên ku riwê xwe
di xwîna wî de raxistibûn

çend pelên sipî bûn!!
.....
yê ku xwîna xwe
- nexşeya demsala pêncemîn –
li ser riwê wan raxistibû
Mûsa ENTER bû!!
.......
yê ku ji tirsa çavên xwe
şev serjêdikirin
mêrkujekî nenas bû!!
***

**şeva çaremîn**

çardeh salî bû
lê....
qêrîna wê şevê
çar hezar salî bû!!
***

**şeva pêncemîn**

Şev bû
Yan jî rewrewka
şevekê bû



Keziya xwe
li bejna min ya şikestî
dialand,
bêyî ku lêbûrîna xwe
ji duh bixwaze
bost bi bost
çarenûsa min ya sibê
dipîvand.
***

**şeva şeşemîn**

Keçên agir
Keziyên xwe di xewnê de
Veşartin
li paş bihara çiyê
li perestgeha zeredeşt
digeriyan
hooo.... Zeredeşt
vaye em hatin:
perestgeh dizanin xwe
veşêrin
lê.... agir ?!!

***

**şeva heftemîn**

Gelek nêçîran
nêçîrvanên xwe
vê şevê
dane ber tîran.
Gelek agirperestan
şerma şevê şikandin
agirek dadan
yek vemirandin.
Tenê Xatûn
li hêviya zembîlfiroş
tenahî kedî dikir… û
gelek xewn ji xew
revandin.



# Şano

**Perde I**

Manî û rengên wêneya xewnan
westiyabûn
Piştî xewneke giraan
li hev rûniştin
Keziya jinekê dihûnan
û wêneya dawî
dixwendin:

**Perde II**

Li bin siya darekê
jinekê
genimek çand
Ji simbilên yekemîn re
lorîka zayîna sêyem
distirand;
"Siya vê darê neşewitînin,

Vê xakê bi hêstiran û xewnên
kirêt
neçînin"

**Perde III**
Û ji nişkave
Ji gundekî Yotobya
zarokek ji xew hilçenî,
qîriya;
"Eger win xewnên min
bidarvebikin
Ezê jî xewa we
bişewitînim".



# Jînenîgariya dilbijokekî

**I**
(ji zayînê ta roja ku ji vegerê re berge nema)

(**dilê min dibije nanê tenûrê**)

Ez hêjî hînî razên nixumandî
nebûbûm
Nejî min bîra axa sor dibir
Dilbijokekî bêvirî
Mîna mizgîniyekê
Carna  dikenîm
carna digiriyam
Dilê min dibijiya nanê tenûrê
.......
nizanim bi çend gêsinan
ez ajotim
çandim û çinîm
Lê
bêrîvanan jî êdî gelek navên min
ezbere şîrvedikirin...

hemû serpêhatiyên nixumandî
mîna axeke ajotî
bêvirî man
û ez ji wê çaxê de
serpêhatiyeke bi bilûra dengbêjan
hatiye ajotin
ji tenûra dayika xwe re
li welatekî
digerim....
....
Nizanim goristana gundê me
bi çend nimêja birîn kirin
û birînên wê bi çend terman
derman kirin....
Lê
hîna venegeriyame
Dilê min dibije nanê tenûrê
ne hînî vegerê bûm
nejî têra tenûra dayika xwe
fêrî ajotina welatekî bûm...
......
Dilê min dibije vegerê



lê ji vegerê re
berge nema
ez ji îro de ji dilê xwe yê
bêvirî re
li laşekî
digerim......
...........

**II**

(ji firîna yekemîn ta bi asmanê dawî)

**(dilê min dibije kulmek asman)**

Ez ji duh ve bi firê ketime
dilê min dibje kulmek asman
Heme kulmek asman
Têra bêhinvedana rima şervanekî
Têra qolinca zayîna dara hejîrê
Ew jî nebû
Têra fincanek ronahî
ji êvarên girtiyan re
..................
Ez ji duh ve

baskên bayê li ber bayê
didêrim
Dilê min dibije kulmek asman
Tenê kulmek
Têra xwedayekî
lava û nimêjên dayika min
berhev bike
Bi qasî bênderekê
ji dêrana xwêdana
bavê min yê kal re .....
Ew jî nebû
Têra kolana navê şehîdekî
li ser kêlên gora min
Ez îro bi asmanan ketim
Dilê min dibije bîstikek firîn
Têra zayîna min..
Nebe
Têra mirinê
…….



**III**
(Ta roja serdana xwedê)

**(wisa di nameyên xwe de nivîsîbû)**

… Ez ne dizê agir bûm
Berî ku dilê min bibije Te..
…..
… Min çi dizanî ku
Artêşa şevên binkeftinan
Wêrekiya te talen kirine….
……..
…Te dizanîbû rêyên xwedê
di dojehê re derbas dibin…
..Her ku şev dibû
Mîna tariyeke tirsok
Ji agir direvî……
…..
…Bawer bike
min jî dizanî hinek rêyên xwedê
di buhiştê re derbas dibin
Lê her ku roj hiltê
Mîna derwêşekî dudilî

rêyên buhiştê yên dirêj
di kêlîkên dilbijokiya min de
Hilnayên.....
…….
….Ger dilê te bijiya lerzînekê û
serdana xwedê
were
em bi tariyê re bişewitin
ber bi rojê ve bifirin
Bila agir
mîna dojehekê tariyên te
Careke din
netirsîne
Bila rêyên buhiştê
li pêşiya kêlîkên dilbijokiya min
dirêjtir nebin….
……



**IV**
(ji alboma wêneyên wî)

**(mîna ku ji binê fincanê hatine kişandin)**

…. weke win dibînin
di hembêza dayika xwe de ye
ji mijê
kenê wî ji giriyê wî ne diyare…..
…..
li vir xatir dixwazê
lê ne diyare ji kê….
….
Ne diyare ji kûdera xwe
birîndare lê
birîna wî hîna germe….
…..
li aliyê rastê riwê zayîna wî ye
li yê çepê yê mirina wî ye..
di navê de ew bixwe ye
lê bikîjan riwî ye
ew jî ne diyare…

# Ew helbest

Ew helbestên ku min
ji çavên te dizîbûn,
her êvar
dema ku tu
ramanên xwe yên fedyok
li tariyê dipêçê,
Dema ku
ken
di bawişKîna xewê de
li ser çavên te
xilmaş dibê,
tu û tenahiyê
di hembêza
xewnên bê guneh
yên ciwaniyê de
radizin.
Wê demê,
ew helbestên ku min
ji çavên te dizîbûn,



yeko yeko
Bêyî ku xatir
ji min bixwazin
hêstirên xwe dişon
biskên xwe dihûnin
stêr bi stêr
Ji tenahiya min re
li çavên te
digerin.

## Riwê te

Mîna zivistanê bû
wê salê
bayê Qerecdaxê
di hembêza Edûlê de
kuliyên berfê
diçinîn
û bi ser riwê te de
berdabûn... !
û her ku berf dibarî
riwê te
mîna kenê
zarokekî,
germbû
bi ser tenahiya min de
diwerivî.
Mîna zivistanê bû
wê rojê,
riwê te
Ji nişka ve



bi ser giriyekî de
rijiya.
Mîna vê rojê bû
wêneya dawî ya riwê te
ne gewr bû
Hingî min zanî
ezê mîna vê rojê
bi tenê
li bajarekî bê reng
ji giriyê xwe re
li riwekî
bigerim.

# Sersalname

(ji Mihemed Bîlal Yûsif re)

sersala te xweş be
Enkîdo.
".. serê salê binê salê.."
hebû tunebû
guh bidin çîroka
vê sersalê…
" çîrokê çîvanokê,
ez kuncî tu kuncî,
ser tehtikek narincî
tu firî ez mam li cî.."
sersala te xweş be
Enkîdo,
tu hîna xweşik bû
ku wisa mîna oxirê
birijê,
oxirbe, lê
tu hîna xweşik bû
ku wisa berî çavê mirinê



birijê,
tu hîna xweşik bû
ku wisa berî hêstirên
dîlbera xwe
birijê.
".. ev gor
ya pakrewanekî ye.. li
dîlbera xwe digeriya .."
de bi gere helbestvano
bigere..
vê sersalê
rêyên mirinê
bi ser rêya çiyayê kurmênc de
şikestin..!
ne te digot:
".. ezê vê sersalê
mirinê jî hînî xweşikbûnê
bikim.. " … lê
mirin jî berî sersalê
fêr bû ku
di vê yotobiyaya derew de
tu çav ji çavên te xweşiktir

çavan nagirînin…!
De bigrîn û bigrîn
Vê sersalê girî jî
Bi qasî kenê ENKÎDO xweşike.
Sersala te xweşbe
Enkîdo, … lê
tu hîna xweşik bû
ku wisa berî " oxirbe "
rijiyayî……!



## Derya

Ez…
Her êvar
navekî xwe
li ser wêneya zarokekî
nîgar dikim û
li wê derê, ku
hemû reng dibin
derya,
ez jî li pey qeyîka
hêviyên westiyayî
bi ber pêlên deryayê
dikevim,
ji sibê re li navekî
digerim.
Lê îro…
ne ez dizanim navê min
bûye çi..!
ne jî ev derya….
Ev derya,

nizanim ne ez biyanî me
……ne ew,
lê dizanim îro
me herdiwan
di kûrahiya bê dengiya xwe de
gelek û gelek
nav
li ser wêneya bîranînekê
                    nîgar kirin
û
li wê derê winda kirin.



## Cejin

Xweziya tu tiştekî din bana
tiştekî min bana
tiştekî  ji bilî ku ti niha
ewî…
Dayik ba
Xwişk ba
Rengê azman ba
Yara min ba
Yan jî tiştekî din
tiştekî  ji bilî ku ti niha
ewî..
û salê carekê
cejin pêrgî şeva min û te
bihata
Wê hingê
ezê di hembêza
Çîrok û çîvanokên te
razama… razama…
Berê sibê

ku te giriyê minî xilmaş
bidîta
te yê bizaniya ku
di hembêza cejna te de
girî jî bi qasî
ramûsanekê
xweşike.
Wê hingê
te yê hêstirên minî
ji mêj bêriya riwê te kiribûn
ji xew şiyar kira
û
te ji min re
yan min ji te re
bigota
…cejna te pîroz be….
Minê rojekê
kurte çîroka evîna
derya û azmanan û rengê
şîn,
ji tere bi gota
lê heger ku ti tiştekî din bana



tiştekî ji bilî ku ti niha
ewî
dibe carna
min ji te re bi gota
Dayê….
Xwişkê…
Û carna jî yarê
Lê salê carekê
ku cejna te
li asoya deşta Eyin Dîwerê
Pêrgî rengê evîna min û te
bihata,
berê sibê
teyê hêstirên minî
ji mêj bêriya
kenê te kiribûn,
ji xew şiyar kira
û te ji min re
yan min ji te re
bigota
…..cejna te pîroz be….

## Tenahî

Mîna tenahiya stêrekê
bêdengî...
........
Niha tê bîra min
Em li kûderê
hînî demsala ciwaniyê bûn
li kû derê
cara yekemîn
şewitîn
.....
Wê demsalê
ez ji te
tu jî ji stêran
hînî
şewata dawiya şevê bû bûn
lê...
Nizanim agirê Kîjan hezkiriyê te
xwe fêrî tenahiya te kiriye
îro..



Kîjan helbesta te
sitrana te
Kîjan dilê te
mîna pirpirîkekê
bi agirê hezkiriyê xwe
di şewitê
dibe xwelî... û
di valehiya vî asmanî de
belav dibe....
.............

Mîna bêdengiya stêrekê
bi tenêyî
îro...
Nizanim Kîjan bîranîn e
xwe hînî bêdengiya te
kiriye... û
bûye dildarê şewata te..!!

## Tu jî mîna min î

Tu jî mîna minî
Û....
........
Ez biyaniyekim.
Min ji mêj
temenê xwe sipartiye
demsala serxweşiyê
serxweşiya xwe sipartiye
Piyaleke din
û din.
Dergehên dilê xwe
di laşê mêraniyeke sitûxwar de
veşartine
ji siya hebûna xwe re
li nasnameyekê
digerim.
***
Tu mîna minî
Û..



Ez xwînî me..
Di xencerê de şûna pişta min
mîna dafka kewê,
xwe veda ye.
Ez hîna dilopek
şîr bûm
ji pişta lerzîneke
şeveke zivistanê diketim
malhêvana çêbûneke
tîr,
Peymana bidarvekirina
xwîna min
li Mehabadê hatibû
rêsan
Ez xwînî me û hîna jî
ji dû şopa birîna min
venegerîne
***
Helbestekim
Kevirên şorerşê
ji qorziyên şikestina xwe
berhev dikim.

Gewdê hilweşîna xwe,
pûtê hesinkarekî
di hestiyê serhildanên ku
xwe ji zinaran werkiribûn de
dikolim.
Riwê hilweşîna xwe,
wêneya keziyên şewitî
ji rengê xewnê ku
mîna dilê Xecê
bi ser birînên xwe de rijyan
nîgar dikim.
Û hîna jî helbestim
di kernevala serjêkirina
komarê de
mîna çirayekê dişewitim..
... di şikêm û
ji qorziyên şikestina xwe
kevirên şoreşê
berhev dikm.
***
Tu jî mîna minî hevalê
lê ez bi tenê me



û ji tenahiyê bûme
karwanekî rêwiyan...
Dilê min di cejna
dînbûna xwe de
mîna sînorekî
li sitiriyên rêwîtiya min
hatiye hûnan
.....
Şopvanê rêya min
hîna ne westiya ne
çavên wan li rojhilat e
ku li stêra min digerin.
Carna li ser gora felekê
sitranan diçînin,
çaxê ku Adar di singa
tembûra Mihemmed Şêxo de
kulîlk vedide.
.....
Di hembêza dayikên
şemiyê de
pêrgî wêneya
windabûneke min

tên.
Şopvanê rêya min
çavên wan ber bi
                rojhilate ku
bi çiyan dikevin.
Di gewdê birîna minî
                    germ de
nimêja berbangê dixwînin
li ser darbesta min
nexşeya rêwîtiyeke nû
                        radixin û
.....
Carna mîna çavên
zeriyeke fedyok
çîroka evîna xwe û rojê
di paş bijankên şevê de
                    vedişêrin
Carna jî li Zagrosê
di bin aşûteke berfê de
ji nişka ve…
…radizên
…radizên



…radizên
***
tu jî mîna minî
…he…
…va…
…lê…
lê…. Li min bibûre
ez ji duh ve
bi taya bayê bêrîkirinê,
sî salan
şewitîm
bûm pelek dûman
û...
bûm...
.....
min bibexşîne
...... bi xatirê te

## Bîranîn

Min raserî her bîranîneke te
gundek avakiriye.
Êvar bi êvar
mîna babadewrêşekî
li kolanên gundên te
digerim
Li ber şaneşîna
bîranînekê
zembîlan difroşim.
Lê vê payîzê
nizanim Kîjan baye
ez mîna Mecosiyekî agirperest
kirime dildarê şewata
gundên te.
Ka vegere bêmal
heme carekê....
bi qasî payîzekê
vegere.
Heger nebû



têra bîranînekê
vegere.
Min hemû bîranînên te
di piyalek "dem" de
meyandin
û di şevbuhêrkek şînê de
li heval û hogirên xwe
belavkirin
Niha jî bi qasî havînên
"Girkê legê"
tiyê bîranînekê me...!
heme têra bîranînekê
bi qasî helbestekê
vegere.
û heger nebû
têra
ramûsanekê...

## Pirs

Ez ne çemekim
ji malzaroka çiyê
ne zame...
Şîrê tu zinar û berqefan jî
ne mihtiye...
Lê ji min nepirsin
tu çima wisa mîna Firatê
bi ser taya xwe de
dirije?..



## Ezê bêm..

.......
Nizanim tu ji Kîjan bîstikên
şevê hezdikê
Lê..
Ezê yan êvarê
yan jî wekî tu hezdikê
bêm...
Ku îro dereng be
ezê ji par ve,
ji pêrar ve.. bêm
Ku dereng be
ezê xwe ji nûve
zêm û
bêm.
Hemû gunehên xwe li ber
dadgeha te raxînim.
Tewanbarim,
bi kuştina te
şewata şevên xwe

tewanbarim bi vegera xwe.
.....
Dibe ku dadgehên te
têra gunehên min nekin!!
Dibe ku çîroka bidarvekirina min
di şevbuhêrkên te de
têra bîstikek girî,
bîstikek ken jî neke.
Di be ku dadmendên te
li min bibûrin û min bisipêrin
bê dilovaniya asmanan....!!
Lê....
Her ku payîza xewnên min
Di ber wêneya êvarên te re
derbas bi be
wê gazina awirên te
mîna agirê Nemrûd
min di nava êzingê
poşmaniyê de bi şewitîne..
.......Weke tu dixwazê
ezê bêm.... lê
bila stêrvanên şevên te



rêya hevirmêş li karwanê min
ne birin.
Ez hêjî Mîdiyekî çiyayî me
Lê min têra çavên te
awirên xwe yên kûvi
kedî kirine û
Têra ajotina hemû zeviyên
Genimê te
Xwe fêrî cotyariyê kiriye.
Têra gelek û gelek
Zivistanan
Şevbuhêrk berhev kirine
.......
Nizanim tu di kîjan demsalên
helbestê de kevokên xwe
di firîne
lê ezê yan êvarê
yan jî wekî tu hez dikê
bêm.....

## Ji hemwelatiya baranê û

## Serhildanên hilweşiyayî re

ez û tu bûn
.............
wê zivistanê
her tişt biyanî bû
Beyrûd, Rewşê, Deryaya sipî
Tenê ez û tu
hemwelatiyên serhildanên
hilweşiyayî bûn
li baranekê digeriyan
Wê zivistanê tenê riwê te
ji baranê sipehîtir bû
lê kî dizanî
tu di kîjan demsalê
bi ser kîjan riwî de dibariya
wê rojê
Tu ne diaxifî
çavên te jî ji bilî ku



(bêriyê kirine)
li tiştekî mukir ne dihatin
....................
wê zivistanê
keştiyên te
bi deryayê ketibûn!
ji bilî min
gelek laşên din
bûbûn sî û bejna te
dibirîn
Gelek sî dibûn bejin
û laşê te di baranê de dirijandin
ji bilî baranê
çar demsalên din jî
bi ser awirên te de
dişikestin
Ji bilî demsalên (Vîvaldî)
gelek sîmfoniyên din
di bêdengiya te de
westiyabûn.
Pir şikestin!
Pir westiyan!

Lê
keştiyên te ji ser
Derya sipî venekişiyan
.......................
Îro, çaxê ku baran dibariya
dîsa her tişt biyanî bû
Beyrûd, Rewşê, Deryaya sipî
Tenê ez û baranê
du serhildanên hilweşiyayî
li hemwelatiyekî digeriyan
Îro çaxê ku baran dibariya
ez hîn bûm ku
ewê keştiyên te yek bi yek
dişewitandin
ne derya bû
ewê awirên te bi ser xwe de
dişikandin
wê zivistanê
ne
ez
bûm....



# Helbestên Te

(ji Helbestvan Axîn Welat re)

(Helbestên te yên duh)
.......
Gelek sersal
bêyî ku şopên xwe winda bikin
di gundê te re derbas dibûn...
Gelek zarok
bêyî ku xatirê xwe ji te bixwazin
ji temenê te bar dikirin
.........
Piştî hemû sersalan
dîsa gelek malikên helbestên te
yên duh
mîna xwe mabûn
Asman
Şevên sersalê
Gundê te yê bi du navan
Rêya tirênê ya hesinî...
Tenê keziyên te dirêjtir dibûn

û bejna te
mîna şaxên Lavlavkê
bi neynikan ve hildikişya....
..........
Nayê bîra te
tu cara yekemîn di Kîjan
neynikê de
hînî xwe bûyî
Nejî neynik dizanin
di Kîjan wêneya zarotiya te de
cara yekemîn
şikestin.....
.......
***

(helbestên te yên îro)
…………
neynika te ya duh
êdî têra xwendina
wêneyên te yên îro nake.....
......
ne hindikin



malikên ku mîna te
mane
mîna te dikenin
mîna te digirîn
mîna te radizên
mîna te keziyên xwe şeh dikin......
Lê
ne hindikin
malikên te yên ku îro
heme îro
bi tîrekê
ti kuştin
bi tîrekê kuştiyên te zindîkirin...
......
Neynika te ya duh
êdî têra xwendina
wêneyên te yên îro nake...!!
Sersalên di rûpelên bîranîan de
bûbûn payizeke zer..!!
Hevalên bi qasî
xwendina fincana te jî
rûneniştin..!!

Şevên zivistanê yên dirêj..!!
Berçavka te ya
di nav toza xatir xwestinê de
westiya
westiya...!!
û
Dûmana cixareya te ya ku
têra veşartina bîstikek bêrîkirin jî
nake..!!
.......
Nayê bîra te
tu di Kîjan malikê de bûyî
Axîn
nejî Axîn dizane
di Kîjan wêneyê de
konê xwe li ser riwê te
vedaye..
.........
***

(helbestên te yên sibe)



........
Payizek û
gelek demsalên din..
Kenek û gelek giriyên din..
Derya û asman û
gelek rengên din..
Evîn û
gelek razên din
Helbest û
gelek
malikên din
Neynikek û
gelek wêneyên din...

## Newrozname

I
Du awiran
newroz bi hev diguhestin.
Du newrozan
gustîlk bi hev diguhestin.
Lê Beko.....
Awirek li newrozê
yek li gustîlkan
bi hev diguhestin..!!

II
Na,
ne wisa wêneyên newrozê
hatibûn nîgarkirin...!!
Ne wisabûn carê rengên
riwê te...
wê ne wisa razin carê
zarokên te.
Ku tu dişewitê jî



ji newrozê
xweşiktirî.....
..... Helebça...!!!!

III
ez bûm……
yan jî
siya yekî mîna min bû
vê newrozê jî
dîsa..
li ber keviya vê rê
li hêviya te
şewitî, bû xwelî
lê….
Ne tu hat,
Ne jî newroz
mîna her sal
dişewitî…..!

IV
Nameyek jî..
...........
Ji xwedayên agir re...
Ji Zeredeşt re...
Ji Mezlûm DOGAN re..
Ji keçên agir re...
Ji keziyên Zekiya,
Ronahî,
Bêrîvan,
Zîlan,
Rehşan....û... re
Ji Helepça re..
Ji zarokên Amûdê re..
Ji evîndaran re..
Ji Mem û Zîn re..
Ji Beko re..
Ji... taya minî sar re...
...........
Wê ne wisa bişewitin carê
Newroz
..... newroza we pîroz be......



## Jı bêhişekî ku ji biharê bez kir re

Wisa ji nişkave
di bîstikek newroz de
tu bûyî helbesteke Beyrûtî
çawa ku demsal
di bîstikek bihar de bûbûn
Lîloz...
...........
Newroz
bêhnikên ku temenê me
di agir de
agir di temenê me de
dişewite
dibe agir....
Dengvedana dîrokeke riziyayî
li bîra me dixe
mêraniyeke stûxwar, qêrîna
serhildanên hilweşiyayî û
komareke bidarvekrî

hişyar dike....
.....
Lê bihar hevalo
kêferata rengan e
di awirên me de
riwê xwe yê din bi heft rengan
dixwînin.
Bihar
binkeftina me ye
di riwên me yên
Havînî
Payizî û
Zivistanî de
li rengê xwe digere.....
.....
Wisa ji nişka ve
siya te ya ji
mirin û zayînê westiyayî,
siya Mîdiyê te yê
hilweşiyayî
mîna dêwekî
raperiya.




Sergermiya êlên koçeran û
Hêrsa pezkoviyên dîn
jibîrkiriye
Tîra xwe kişandiye ber
kevaneke xilmaş
li kevneşopa çîroka xwe
digere....
.........
Heme wisa
ji nişka ve
zembîlfiroşên te
ala poşmaniya xwe
di şaneşînên bendêmayînê de
bidarxistin,
bê hiş bi çolan ketine
hişmendiya şevê
di xweveşartina ji ber çavên
Bekoyan
dipîvin....
......
Ka hêbe hevalo
hêbe

.....
Leşkerên xwe yên serxweş
ji ser konê koçeran
vekişîne...
Ew bihara ku di
bîstikeke şîn de
tu bê hiş kiribû
wisa
ji nişkave
mîna awirekê
hat û
 çû...



**Kemal Necim**




- Helbestvanek ji gundê Girkê Legê li bajarê Dêrikê (Başûrê-Rojavayî Kurdistanê)
- Yek ji desteya sernivîserên kovara Sorgul e, ya ku bi zimanê erebî li Beyrûtê derdikeve.
- "Kezîzer" pirtûka wî ya pêşî ye; sala 2002an ji aliyê weşanxaneya Amerda li Beyrûtê hate çap kirin
- e-mail: necim@amude.com